# Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (252) | Îlon / 01-09-2023

## Şer û aloziyên li Dêrazorê

# ENKS, zimanê gefxwarin û tirsandinê ji her aliyekî ve red dike

**Kurdistan**

Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê (ENKS) derbarê şer û aloziyên li Dêrazorê yên di navbera HSD û hin Encûmena Leşkerî ya Dêrazorê de derketiye, zimanê gefxwarin û tirsandinê ji aliyê her aliyekî ve red dike û bang li her kesî dike ku rê li ber hewildanên gurkirina nakokî û dijmantiya Kurdî-Erebî bigirin.




Roja 27ê Tebaxa 2023an, HSDê, li bajarê Hesekê Fermandarê Encûmena Leşkerî ya Dêrazorê ya ser bi HSDê ve (Ehmed El Xebîl) Ebû Xewla û hejmarek din endamên wê encûmenê girtin. Di encamê de, çekdarên Encûmena Leşkerî ya Dêrazorê û eşîrên Ereban êrîşî çend xalên HSDê li Dêrazorê kirin. Li gorî amarên Rewangeha Sûrî ya Mafên Mirovan, di encamê de jî 16 çekdarên eşîrên Erebî û 6 şervanên HSDê û 3 sivîl hatine kuştin û hejmarek jî birîndar bûne.

êl û eşîrên Ereb li bakurê rojhilatê Sûriyê seferberiya giştî li dijî (HSD) ragihandin û 12 demjimêr dem ji bo azadkirina Ebû Xewla û girtiyên din, dane HSDê.

> **Hin alî aloziyan berev şerekî Kurdî-Erebî ve dibin**

ENKSê di vê derbarê de di daxuyaniyekê de ragihand, "Ji ber pirbûna navendên hêzê, aliyên çekdar û nakokiyên wan ên berdewam, ji roja Yekşemê 27ê Tebaxê ve, şerekî navxweyî di navbera hevpeymanên hêzên Hevpeymaniya Navdewletî de, di navbera HSDê û Encûmena Leşkerî ya Dêrazorê de derketiye û alozî li hejmarek deveran rû daye. Ji encama wê jî aliyên şovenîst ên girêdayî rejîmê û eşîrên din hewl didin ku ji rewşa derketiye, derfet bibînin û fitneyê û dijminatiya Kurdan bi giştî gur bikin û kiryarên serkideyên HSDê bikin sedema gurkirina nakokiya Erebî-Kurdî."

ENKSê dibêje: "Tiştê ku gelê Sûriyê ji destpêka şoreşa xwe ya li dijî stemkariyê ve bi ser ketiye ew e, pirên pêwendî û hevgirtinê di navbera pêkhateyên Sûriyê de ava kirine, ku rejîmê bi dehsalan kar ji bo hilweşandina wan kiriye. Gelê Kurd li Sûriyê jî, herdem ji bo bihêzkirina wan piran û xurtkirina biratî û hezkirinê di navbera hermû pêkhateyan de li pêş bû û ti carî êşa û zulma ku ji aliyê rêjîmê ve hatiye serê wî, nexist stûyê ti pêkhateyeke gelê Sûriyê.

ENKS tekez dike, "Di demekê de ku ew zimanê gefxwarin û tirsandinê ji aliyê her aliyekî ve red dike û her axaftinek ku kîn û nakokiyan di nav gelê Sûriyê de bi hemû pêkhate û mezhebên xwe ve derdixe, şermezar dike.

> **Divê taybetmendiya her herêmekê parastî be**

Di heman demê de bang li parastina nasname û taybetmendiya her herêmekê dike ku ji mafê xelkê wê karûbarên xwe birêve bibe. Herwiha bang dike ku bi hişmendî û dilsoziya bi qurbaniyên Sûriyê yekîtî û hevgirtina xwe biparêzin û rê li ber hewildanên gurkirina nakokiyên nav civaka Sûriyê bigirin."

> **Pêwîste kar li ser bihêzkirina bingehên pêkvejiyanê bê kirin**

Herwiha ENKS bang li her alî dike ku kar li ser bihêzkirina bingehên pêkvejiyana biratî û hevbeşî di navbera pêkhateyên Sûriyê de bike, wek bingehekê ji bo avakirina Sûriyeke firehalî û demokratîk ku destûra wê mafên gelê Sûriyê nas bike û hemû tê de di nava aştî û aramiyê de dijîn.

---

**Xwepêşandanên Siwêda berdewam in, xwepêşander daxwaza çûna Esed dikin**

*Rûpel—2*

**Vekirina dibistanan û pêşerojeke winda**

*Rûpel—3*

**Albuma nû ya Ciwan Haco derket**

*Rûpel—4*

# Xwepêşandanên Siwêda berdewam in, xwepêşander daxwaza çûna Esed dikin






**Kurdistan-Ehmed Omer**

Ev dema zêdetirî deh rojane xwepêşandanên xelkê parêzgeha Siwêda berdewam in, û roj bo rojê xalên xwepêşandanan zêde dibin, xelkê wê parêzgehê daxwaza başkirina rewşa jiyanê û rûxandina rejîma Esed dikin.

> **ENKS piştevaniya xwe ji bo xwepêşandanên Siwêda ragihand**

Emîndariya Giştî ya Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS di daxuyaniyekê de piştevaniya xwe ji xwepêşandanên parêzgeha Siwêda û deverên din li Sûriyê ragihand. Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS wiha di daxuyaniya xwe de radighîne: Ligel têkdana rejîma Esed ji prosêsa danûstandinan ya bi serperiştiya Neteweyên Yekgirtî re, û girtina asoyan li pêş çareseriya Siyasî li Sûriyê, herwiha ligel nebûna ti destpêşxêriyekê ji bo çareserkirina rewşa jiyan û abûriyê û piştguhkirina êş û azarên gelê Sûriyê û sivkatiya vê rejîmê bi rûmet û jiyana xelkê, xelkê Siwêda careke din derketin ser kolanan, û xalên xwepêşandanan hêdî hêdî zêdebûn û gihiştin zêdeyî 40 xalan li nava Siwêda û gundewarê wê, herwiha xelkê parêzgeha Der'a jî derketin xwepêşandanan û diruşmên daxwaza başkirina rewşa abûrî derbas kirin û durişmên wan bûne siyasî û niştîmanî ku daxwaza rûxandina rejîmê û cîbicîkirina biryara 2254 û demokrasiyê kirin, herwiha bi beşdarbûna Şêxên Durziyan xwepêşandan bihêztir bûn yên ku tekezî li ser aştîbûna xwepêşandanan kirin û daxwazên wê di azadî û rûmetê de.

> **Pêwîste civak navdewletî bi berpirsyaretiya xwe rabe**

Ev xwepêşandan û diruşim yên ku xwepêşanderan bilindkirin tekezî li wê yekê dike ku tişta dibe derbirîne ji îradeya gelê Sûriyê yê yekgirtî re bi hemû pêkhateyên xwe di pêwîstiya pêkanîna guhertineke bingehîn û bidawîkirina sitemkariyê û cîbicîkirina biryara navdewletî 2254 û avakirina Sûriyeke demokrat firehalî ji bo hemû Sûriyan.

> **Daxwazên xelkê Siwêda siyasî ne**

Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê di heman dema li kêleka tevahiya xelkê Sûriyê radweste di vê krîza wî de, ew ligel xelkê parêzgeha Siwêda û deverên din radweste di daxwaza wan de ji bo azadî û rûmet û jiyana mirovane de, û daxwazê ji Neteweyên Yekgirtî û Komkara Erebî û Civaka Navdewletî dike bi berpirsyaretiya xwe rabe di pêbandkirina rejîmê bi cîbicîkirina biryarên navdewletî û dîtina çareseriyeke siyasî ku gelê Sûriyê ji êş û azaran rizgar bike û ewlekarî aramiyê li deverê pêk bîne. Li ser rewşa parêzgeha Siwêda, Rojnameya Kurdistan nerîna hejmareke rewşenbîrên wê parêzgehê stendiye. Mamosteyê Felsefê û Çalakvanê mafên mirovan Silêman El-Kifêrî got, tişta niha li Parêzgeha Siwêda rû dide şoreş e, û xelkê me daxwaza rûxandina rejîma Esed dikin, û dixwazin rewşa abûrî û rewşa jiyana xelkê baş bibe, niha daxwazên xelkê gelekî zêde bûne û nema wek berê tenê daxwaza başkirina rewşa jiyana xwe dikin, niha daxwazên wan siyasî ne, parêzgeha Siwêda taybetmendiyeke wê heye û divê Sûriyeke demokrat were avakirin ku mafê hemû pêkhateyan têde parastî be, û mafê ti pêkhateyan neyê xwarin û di nav wan de Kurd ku ew jî xwedan dozeke rewa ne di nava Sûriyê de.

> **Xelkê Siwêda daxwaza çûna Esed dikin**

Çalakvanê Siyasî Merwan Hemze ji Rojnameya Kurdistan re got, nabe daxwazên xelkê Siwêda were piştguhkirin, û daxwazên xelkê me niha siyasî ne û ez di wê baweriyê de me dê xwepêşandan berdewam bin heta ku daxwazên me wek xwepêşander werin cîbicîkirin, lewma divê hemû alîkariya me bikin û piştevaniyê bidin xwepêşandanên xelkê Siwêda. Pêwîste biryarên navdewletî werin cîbicîkirin û di nava wan de biryara 2254 û çareseriyeke siyasî ji rewşa Sûriyê re were dîtin ku mafê hemû xelkê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe parastî be.

# Koça ciwanan ji Kurdistana Sûriyê zêde bûye



Kurdistan- Diyar Xalid
Li Kurdistana Sûriyê, koçberiya ciwanan berev welatên Ewropa roj bi roj zêde dibe, rojane bi sedan ciwan koçber dibin û bi rêyên qaçax derbasî deverên di jêr desthilata Tirkiyê li Girêsipî û Serêkaniyê dibin û ji wir derbasî Tirkiyê dibin û pereyekî zêde didin qaçaxçiyan. Welatiyek li ser vê mijarê wiha ji Rojnameya Kurdistan got, rojane bi sedan ciwan ji ber rewşa abûrî ya xerab direvin û berê xwe didin Ewropa, ev ciwan pereyekî zêde didin qaçaxçiyan heta ku bighên wan welatan, sedema sereke ya reva van ciwanan bêkarî û rewşa jiyana nexweş e ku ne av, ne kehreb û ne xaz peyda dibe, ciwan li pey jiyaneke xweş digerin û ew vê jiyanênema qebûl dikin, lewma heger çareseriyek neyê dîtin dê rewş xerabtir bibe û koça ciwanan dê zêdetir bibe.

> **Leşkeriya neçar sedema sereke ya koça ciwanan e**

Welatiyekî din dibêje, koça ciwanan sedema wê ne tenê abûrî belkî pirsgirêkên din jî hene, wek leşkeriya neçar ku Partiya Yekîtiya Demoqratîk PYD bi ser ciwanan sepandiye, vê leşkeriyê di dema dawî de bûye sedema koça bi hezaran ciwanan ji Kurdistana Sûriyê, herwiha xwendin jî yek ji wan sedeman e ku dihêle ciwan dest ji welatê xwe berdin, niha PYD rêbazên xwe yê xwendinê li ser ciwanan ferz dike, û hemû kes dizane ku ev rêbaz bê pêşeroj in, lewma ciwan dixwazin biçin Ewropa heta ku xwendineke baş ji xwe re bidest bixin.
Welatiyekî din jî dibêje, koça bi giştî baca wê gelekî mezin e, ev ciwan rastî gelek zehmetiyan tên, hin ji wan jî naghên mirada xwe û di rê de jiyana xwe jidest didin.

# Vekirina dibistanan û pêşerojeke winda

**Hêvî Delî- Qamişlo**

Di 4ê Îlona 2023an, sala xwendinê ya nû 2023-2024 li seranserî Sûriyê destpê dike û dibistan têne vekirin, û êdî pêwîstiya şagirtan bi kirîna hemû pêdeviyên dibistanê heye.
Bi nêzîkbûna vekirina deriyên dibistanan li Sûriyê bi giştî, bare li ser milê malbatên Sûriyê girantir dibe, ji ber bilindbûna nirxê kelûpelan di nav wan de xwestek û pêdeviyên dibistanê wek Pirtûk,Çente û Çilûberg.
Rojnameya Kurdistan derbarê mijara vekirina dibistanan nerînên welatiyan stendiye.
Welatiyek bi navê "Hesen" dibêje: "Rewşa abûrî bandoreke neyînî li ser jiyana welatiyan ya rojana dike û dibe sedema hejariyê li Kurdistana Sûriyê û taybet di werzê xwendinê de ku her sal rêjaya şagirt û xwendekaran kêm dibe û piroseya xwendinê têk diçe ji ber di vê rewşa awarte de xelk nikarin pêdeviyên gerek ên taybet bi dibistanê ji zarokên xwe re peyda bikin ji ber gelek welatî xwedan rewşeke abûrî xerab in û kêm pere ne, û ji hemû firoşkaran re dixwazin alîkar bin bi hemû xwendekaran re".
Li Kurdistana Sûriyê taybet li Herêmên Kurdî du rêbazên xwendinê têne dayîn, yek ji wan rêbaza xwendinê ya bi ser rêjîma Sûriyê ve ye, û rêbaza xwendinê ya rêveberiya PYD, ku heta niha ti danpêdaneke fermî ne navdewletî û ne ji herêmî bi rêbazên xwendinê ya rêvebiriyê nehatiya kirin li Kurdistana Sûriyê, ji ber vê yekê gelek malbatên xwendekaran neçar in zarokên xwe di dibistan û peymangehên taybet de tomar bikin yên ku rêbazên hikûmeta Sûriyê li wan têne xwendin.

Her di çarçoveya vekirina dibistanan, ji aliyê xwe ve mamosteyek dibistanê wiha got: "Sala xwendinê ya nû li hemû şagirt, malbat û mamosteyan pîroz dikim, û herwisa ji aliyekî din ve amaje bi wê yekê kir ku dabînkirina pêdeyiyên zarokan ji bo sala xwendinê bûye yek ji pirsgirêkên nû yên ku rûbirûyê malbatan dibin ji ber buhayên bilind  ên kelûpelan ku ev yek vedgera sedema têkçûna berdewam a lîreya Sûrî li hember dolarên Emerîkî, û herwiha bi vî awayî ev yek dihêla bar ser milê malbatên hejar giran bibe taybet di vê rewşa aloz û metirsîdar de, û di demekê de ku perwerde mijareke bingehîne divê were parastin ji bo misogerkirina şagirtan û avakirina nifşekî azad û pêşarojeke geş.
Hêjaya were gotin ku li gorî raporta salane ya Wezareta Perwerdeya Sûriyê û xişta sala 2023-2024an hatî destnîşankirin, ku dibistan li seranserî Sûriyê ji pola 1ê ta 12an, dest bi sala nû bikin di 4ê Îlonê de, ku dibistan bi rengekî fermî wê vebin.



## Tenduristiya pitik û zarokan (xeleka yekemîn)

# Nelhevkirina xwînê

**Dr. Şêrîn Mele Mistefa (Pisporê nexweşiyên zarokan)**



Nelhevkirina xwînê pirsgirêkek pir mezin e di civakê de bi taybetî bo kesên ku nû zewicîne û daxwaziya wan ew e ku bibin xwedî zarokên saxlem.
Gelek pirs di mejîyên jin û mêran de derbas dibin? Gelo nelhevkirina xwînê wê bibe sedema mirina zaroka me an seqetbûna (astengdariya) zarok û ma gelo em ê karibin bibin dayik û bav?
Nelhevkirina xwînê Gava bav Rh pozîtif û dayîk Rh negatîf be Lihevnehatina Rh'ê wisa pêk tê.
Dayik RH negatîv, bav RH posîtîv û zarok jî RH posîtîv be hingê pirsgirêkek mezin derdikeve holê. Anku nelihevkirin pêk tê.
Heke grûpa xwîna dayikê (0) be û ya bav û zarok (A,AB yan jî B be dîsa nellihevkirina xwînê derdikeve holê.
Bi riya navik û werîsê navikê (cordon) û malzarokê (plasenta) dan û standin di navbera dayik û zarokê de çêdibe. Bi vî awayî dê xwarinê dide pitikê.
Bebek jî (xurdekirinên) metabolizmayê dide dayikê. Dayîk jî van bi riya gurçikan ji laşê xwe diavêje.
Rh pozîtif yanî di xwîna bebek de D antijen heye. Ev bi riya werîsê navik û plasentayê derbasî xwîna dayikê dibe. Hêdî hêdî di xwîna dayikê de antikor tê çêkirin. Ev antîkor di hemilbûna (ducanîbûna) 2emîn de ziyanê dide bebekê.
Heke di ducanîbûnê de jî ji alîyê pisporan ve xweşik dayik neyê şopandin şaneyên bi navê antîkoran xwîna zarokê parçe dike, hemolîz dike. Ev jî dibe sedema Nelhevkirina xwînê. Bêxwînî, zerik ziyanê dide mêjî û dibe sedema têkçûna dil û mirina zarok.
Ji sedî %85 ji mirovan rh +
Ji sedî %15 ji wan jî rh –
Gava grûpa xwîna zarokê di zikê dayikê de RH posîtîv be hingê pêwîste em derziya antî D li dayika ducanî ya di heftiya 28 an de ye, bidin. Lê gelekî zehmete em grûpa xwîna zarokê di zikê dayikê de nas bikin. Heger bê naskirin jî ew jî bi riya fetal DNA amniyosentezê dikare diyar bibe lê zehmete û gelekî biha ye. Lewre jî ew derziya ku li dayikê dikeve bêsebebe ji ber ku ji sedî 15 ji zarokên di zikê diya xwe de grûpa xwîna wan RH neqatîv in.
Dema ku di xwîna mirov de D antîjen tune be hingê grûpa xwînê wekî RH negatîv tê binavkirin.
Wexta dayika Bihemle ya ku grûpa xwîna wê RH negatîv be piştî zarok ji berçûnê jî divê derziya antî D lêkeve.
Ji bo parastina bebekê duyemîn ê ku ji vê dayikê re bibe divê derzî li dayikê bikeve.
Heger dayika bihemle bi baldarî ji alî doktor ve bê şopandin û piştî welidandinê bi 72 saetan derzî li dayikê bikeve wî wextî wê zarok saxlem bê dinyayè.
Heger ew derzî lê nekeve wê zarok pir kêmxwîn be û zerikî be.
Piştî 2-3 heftiyên ji hemlê şaneyên xwîna zarok ji nû ve çêdibin.
Wexta abort anku zarok jiberçûn hebe wê gavê derzî ne lazime.

Lê kengî xetere û risk dest pê dike, di heftiya (8-10) û bi jor de. Ji ber ku abort (jiberçûna zarokê) şaneyên xwînê çêkirine em gruba xwîna zarokê nizanibin jî gerek derzî li dayike bikeve.
Heger xwîna bebekê Rh negatîf be hewcedarî bi derziyê tune ye.
Di dema bihemilbûnê de heke şert û merc tune bin ku grûpa xwîna dayikê were zanîn lê piştî 2 mehan jî heke derfetê naskirina xwîna dayikê çêbûn dîsa jî ne derenge û bi riya testa Îndêrek coombê tê naskirin.
Xwîna pitik bi riya werîsê navikê û plasentayê dikeve nava xwîna dayikê, heke xwîna pitik RH negatîv be li hemberî wê antikor di xwîna dayikê de çêdibe. Lewre jî ew antikor dibe sedema mirina zarokê hemla duyemîn.
Heke di 12 heftiyên pêşî ên bihemlbûna dayikê de lnd coomb posîtîv be di heftiya 28an de divê derzî li dayikê bê xistin.
Ji bo naskirin hewcedariya bi derziyê divê dayik bê navber ji alî doiktorê xwe ve wewre kontrolkirin.
Nelhevkirina A, B û O'yê ne gelekî xerab e û bi taybetî nelhevkirina A, B, Oyê sivik derbas dibe.
Rh, A,B,O bi hevdûn re sivik derbas dibe.
Ji bo tenduristiya zarokan divê beriya zewacê herdu alî beriya ku biryar bidin bibin dê û bav testa xwîna xwe bigirin di dema hemlê de jî her meh ji alî tîma tenduristiyê were şopandin û kontrolkirin

# Albuma nû ya Ciwan Haco derket

Hunermendê navdar Ciwan Haco albuma xwe ya nû ya bi navê "Lêv" belav kir, ku tê de 12 stran hene û album bi awayekî profesyonel hatiye berhemanîn.
Ev album destpêkeke nû ya jiyana hunerî ya hunermend Ciwan Haco ye di sala 2023an de piştî vegera wî ya bo nav hunera muzîkê, ku piraniya stranên xwe jî ji bo evîndariyê gotine.
Ciwan Haco ji Kurdistan24ê re eşkere kir ku stranên vê albumê, bi hezkirinê tijî ne û dildarên Kurd tînin coş û xiroşê, ku bûbû demek li benda wî û berhema wî ya nû bûn, di albuma Lêvê de jî stranên "Hez Dikim, Tu Ciwan î, Çavreş, Seyro, Mektûb, Gulek, Yara Derew, Lêv" têne dîtin.
Her wiha dibêje, ew stranên xwe ji hezkiriyên dengê Ciwan Haco re diyarî dike.

